

Agahî li ser Pêdivîya Girêdana Maskeyan û Tevgerîna bi Maskeyên Devûpoz-parêz

Pêdivîya girêdana maskeyan li NRWê

Ji 22yê Nîsanê vir ve êdî li Bonnê jî girêdana maskeyan pêdivîyek e. Bi vê yekê mebest bikaranîna maskeyên devûpoz-parêz e. Ew wekî maskeyên rûyî, maskeyên rojane, maskeyên çêkirî an jî wekî communitymaske jî tên binavkirin. Ev maskeyên hêsan in û pirî caran ji cawî bi dest hatine dirûtin (potikên pembûyî).

Ev pêdivîya girêdana maskeyan ji bo kê derbas dibe?

Ji bo her kesê! Awarte: Ji bo zarokên ku temenê wan di binîya şeş salî da ye maske navê.

Ez dikarim li ku ji xwe re maskeyan bistînim?

Hûn dikarin li Bonnê li gelek cihan maskeyên rojane (maskeyên çêkirî) bi dest bixin: Wekî nimûne li firoşgehan, li dirûnkeran an jî li bazaran. Bala xwe bidin hişyarîyên bi camekanan ve hatine daleqandin! Rênişaneka dirûtinê ya pîrzanî bi zimanên almanî, erebî, fransîzî, somalî, spanî û ûrdû hûn dikarin li vira bibînin: <https://www.integration-in-bonn.de/startseite/aktuelles/detail/news/wichtig-und-nuetzlich-mund-nasen-schutzmasken-aktionen-und-informationen-in-bonn.html>. Ji bo rênişanên dirûtinê yê bi zimanên din jî li vira binihêrin: https://www.essen.de/gesundheit/coronavirus_6.de.html

Divê maskeyek niha li ku bê bikaranîn?

- li hemû firoşgeh/dikan û pêşangehan
- li bazarên hefteyî, li navendên danûstandinê û li "Shopping Malls"
- gava standin û spartina xwarin û vexwarinan li cihên xwaringehan
- li dezgehên karên senaet, destkarî û xizmetê, gava ku pêwîst be dûrahî mişterîyan ji 1,5 metreyî kêmtir be
- li miayenexaneyên bijîşkan û her wisa li sazîyên xweşî û tendirustîyê
- di veguhastina komî de (otobûs û trêna)

Gelo ez maskeya xwe çawa paqij bikim?

Ji kerema xwe van maskeyên potikî neavêjin! Ku ew carek hatibin bikaranîn, bi tenê divê ew bèn paqijkirin. Wekî nimûne bi vî awayî dibe:

- Maskeyê germ bikewînin ango ûtî bikin
 - li ser 60 pileyê di makîneya cilşoyê de bişon an jî hema maskeyê tê bikin derdankeka tevî pêşokê ango deterjanê, ava pir germ bi ser da vala bikin, bi rêya amûrek an jî şivikeka dirêj maskeyê dualî bi vir va û bi wir va bizivîrin, û gava ku êdî ava we sar bû maskeyê biguvêşin û heta ziwa dibe daleqînin.
 - li ser 80 pileyê ji bo 30 deqeyan biavêjin firineka paqij (bi tenê maskeyên ji potikên pembûyî)
- Her wisa: Ji bo ku maske we û mirovên derdora we biparêze, divê mirov her gav berî bikaranînê û piştî derxistinê destên xwe baş bişo.

Girîng: Maske bi tena serê xwe neparêze! Li gor vê yekê di heman demê de:

- Destên xwe bişon! Çiqas ji destê we hat ew qas pir, bi taybetî, gava ku hûn vegeyîyan malê an jî berî ku we tiştekî xwar. Herî baş 30 çirk, bivênevê bi sabûn û ava germ! Paşê têra xwe ziwa bikin!
- Dûrahîya di navbera we û kesên din de baş bidin ber çav (herî kêr 1,5 metre)
- Ne ber bi destên xwe va, lê erê ber bi milên xwe va bikuxin an jî bibêhnijin!
- Çawa hûn pê hesîyan ku hûn nexweş dibin, li bijîşka (doktora) xwe an jî li bijîşkê xwe herî pêşîn bigerin. Ne ku hema wisa biçin wira. Bijîşk dê li ser telefonê ji we ra bêje, ka divê hûn niha çi bikin.

Agahîyên nû yê Bajarê Bonnê: <https://www.bonn.de/themen-entdecken/gesundheit-verbraucherschutz/coronavirus.php>